Kreis Viersen • Rathausmarkt 3 • 41747 Viersen

Viersen,

**Nameya Xêrhatinê ya Navçeya Viersen'ê**

Dêbavên Hêja,

Wek Qayîm-Meqamê Navçeya Viersen'ê dixwazim bi germî jidayîkbûna zarokê te di roja pîroz bikim.

Bi zarokekî tu gellek guherînan tecrube dikî, tu tecrubeyên nû û bedew berhev dikî. Hevdem dibe ku pirs, guman an heta kêşe û çelinc derkevin.
Ji ber vê yekê Navçeya Viersen'ê dixwaze beriya demê te derbarê xizmetên alîkarîgihandinê haydar bike.
Pişkeke giring a van xizmetan alîkariyên seretayî ne.

**Alîkariyên Seretayî** hejmareke bijardeyên piştevaniyê ji bo malbatên xwe zarokên di temenê 0 heta 3 salî digirie ber xwe. Ev xizmet li gorî hewcetî û atmosfera civakî û belêaş in.

Nemaze ez dixwazim bala te bikişînim ser piştevaniya belaş ji aliyê Çavdêrekê Tenduristiya malbatê û Hemşîreya Zarokan (**FGKiKP**).
Ji bo hemî pirsên li ser nûzza yan zarokê te yê biçûk, wek mînak li ser xwarin, razan, çavdêrî û me-zinbûnê, çar çavdêrên tenduristiya malbatê û hemşîreyên zarokan li cem te hene. Di vî warî da hewcetiyên te bi hestyarî tên fehmkirin û berçavgirtin. Tu dikarî xizmetên şêwirînê li ofîsên bijîşkê zarokan û çend navendên malbatê li taxê bi kar bînî. Şêwirîn hertim di bin pêwîstiya razdariyê da ne û dibe ku heta bi awayê nenas an li atmosfera malbatê werin lidarxxistin.
Ji bo şêwirîneke kesane, zanyarî li ser xizmetan û demên hevdîtinê ji kerema xwe digel xatûn Nina Beckerê bi telefona 02162 39 – 1869 û adresa Emaila nina.becker@kreis-viersen.de têkilî dayîne.

Her wiha tu dikarî zanyariyên pirtir li ser Alîkariyên Seretayî li adresa www.kreis-viersen.de bi dest bixî.

Her wiha tu dikarî li Portala Serhêl a **„Guter Start Kreis Viersen“ (Destpêka Baş a Navçeya Viersen'ê)** li
guterstart.kreis-viersen.de bi dû xizmet û bersivên ku ji bo te giring in, bigerrî.
Bi Kilîdpeyvên fenanî "Kinderarzt" (Bijîşkê Zarokan) û „Familienzentrum“ (Navenda Malbatê) bilez û bêyî dijarî pêşniyazeke guncan têkildarî kûrsên fêrkariyê yan xizmetên şêwirînê dibînî. Te ev derfet heye ku rasterast li hawîrdora cihê jiyana xwe yan bi awayê armancdar bi dû xizmetinan ji bo koma temenî ya zarokê xwe bigerrî.
Vê derfetê bi kar bîne û li Portala serhêl a „Guter Start Kreis Viersen“ (Destpêka Baş a Navçeya Viersen'ê) bigerre.
Ev portal di dema niha da tê çêkirin, lê em hewl didin ku bikarin hemî xizmetan di dema herî lez da nîşanî te bidin. Eger xizmetek ji bo te tineye yan eger pirsine te hene, di vî warî da ji kerema xwe bi rêya adresa guterstart@kreis-viersen.de yan telefona 02162/ 39 18 69 digel me têkilî dayîne.
Xatûn Becker ji bo hemî pirsên te amade ye.

Em ji bo te û malbata te tenduristî, enerjî û hêviyên herî baş dikin û ji bo vê qonaxa nû hêvî diin.

Bi rêzdarî
Qayîm-meqamê we

Dr. Andreas Coenen

Ji bo wergeran ji kerema xwe
Koda QR sken bike:

Pêvek:
Daxuyaniya Portala Serhêl a „Guter Start Kreis Viersen“ (Destpêka Baş a Beşa Viersenê)
Belavoka „KITA-ONLINE“ (Navenda Miqatebûna Rojane ya Zarokan a serhêl)



Rathausmarkt 3
41747 Viersen
02160 39-1006
landrat@kreis-viersen.de
www.kreis-viersen.de